# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (179):

## Gundê "Etmana", jineke ducanî di Hepsa "Maratê" de berdavêje, qutkirina darine zeytûnê û qirkirina daristanine ihracê, geregoşî û serberdayetî






















Weke tekezî ji geregoşî û serberdayetiya ku li herêmê serwerkirî re, û layenkirinek ji rêdanên her giropeke milîseyan re di çarçewa bandoriya wê de, li vê dawiyê û li pêş çavên Istîxbarat û berpirsiyarên Turkiyê, "Xurfit El'ezim- Odeya Elezim" - beşek ji milîseyên "Artêşa Niştîmanî Sûrî"- daxuyanek

derxist, û tê de guhestina otombîlên ku bê nimre û belgetekeziyên fermî -rûdaneke giştî ye di herêmên di bin bandorî û dagîrkeriya Turkiyê de- ji bilî yên Encûmenên xewcihî û Hikometa Demkî ya bi ser Hemahengiyê ve, qedexe kir.

Vaye li jêr hin binpêkirin û tewanên hatine kirin:

**= G."Etmana":**

Bi Navça Reco ve girêdayî ye, /2/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /130/malî pêk tê, dora /800/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, jê tenê /40malbat=150nişte/tê de man, yên din jî bi zorê hatin koçberkirin, û dora /90malbatî=550nişte/ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

/5/ mal di dema topebarankirina gund de, bi piçekî ziyan gihîştinê, û weha jî avahiya dibistana gund, bi ser de jî dizîna kelûpelên tê de û pencereyên wê.

Milîseyên "Firqit Elhemzat" û serkêşê wê yê tê de "Yezîd Ebû Ehmed" gund desteser dikin, û malên "Dilovanber Hec Reşîd Reşîd(Çipê), Nûrî Beko" ji xwe re kirin du biryargehên leşkerî, û beşek ji tiştmiştên hin malan, /7/tirektorên çandiniyê yên ku /6/jê -piştî ku xwediyan vêrgiyine diravî dan- hatin vegerandin, /15/matorên dutekerî, hin perçeyên guvêşgeha zeytûna ya "Dilovanber Hec Reşîd Reşîd(Çipê)" yên di bin kavilên avahiya wê ya bi topebaranê hilweşandî de mane, çadir û pêdiviyên sersaxiyê û guhêztok û keblên herdu toreyên elektirîka giştî û telîfûna zemînî jî, dizîn.

Û dest danîn ser dora /3/hezar darên zeytûnê ji malmewalên yên ne li gund, jê malbatên "Bîlal Bîlal, Çolaq, Arêf Misto", û vêrgiyên têvel jî li xelkê ferz kirin; Û Encûmena Xwecihî jî li Reco vêrgî li ser werzên zeytûna ferz kirin.

Û milîseyan ji bo êzingkirin û bazirganiyê, li dor gund hin daristanên ihracê qut kirin, û agir jî berdan hin din; Û ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên veşartî û dizîna wan, hin girên kevneşopî kolan û tevdan.

Û xelkê ku li gund mane jî rastî cûrbecûr binpêkirin û tewanan hatin, mîna kuştin, revandin, girtinên bêsûcane, işkencekirin, rûmetnizimkirin, peresitandin û hin kiryarên din. Hin bi tewanbariya têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re -jin jî di nav de- bi demên têvel hatin girtin; Hemwelatî "Mihemed Se'îd Reşîd kurê Ebid Elmecîd/58/sal", li 4.11.2019an, li Cîgeha "Geliyê Tîra" - N.Reco, dema ku ji Navenda Turkî ya kirîna zeytê ya li Gunvêşgeha Taxa "Rif'etiyê" - B.Cindirêsê vedigeriya mala xwe, hate revandin, û li 1.2.2020an milîseyan merivên wî bi dîtina termê wî li rex Gundê "Hisê" agahdar kirin, û paşê hate xuyakirin ku ew tûşî işkencekirin û kuştina qurşînê hatî, û dest girêdayî bû jî.

Û dema neçarkirina hemwelatiyan bi derxistina nasnaman, navê gund ê resen "Etmana" bi "osmaniyê" hate guhertin, di bendê "ciyê rûniştinê" de, li ba Nivîsgeha Nasnaman li Reco.

**= Beravêtina jinekê li Hepsa "Maratê":**

Di encama işkencekirinê û danûstandina sert a ku li ba "Asayêşa Efrînê - Ewleya Siyasî" dîtiye de - jerkî ku li 12.9.2021an Z bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re hatiye girtin ve - hemwelatî "Arîn Mihemed Dilî Hesen/25/sal" ji xelkê Gundê "Kîmarê" - Şêrewa, di Hepsa"Maratê" de (ya ku ji bîst rojan ve - piştî sê heyvan ji veşartinê- bo wê hatiye guhestin) beravêt; Û makzarokê mirî -/6/heyv- radestî xwediyê jinikê hate kirin, û li goristana gund hate veşartin; Hêjaye were bîranîn ku "Arîn" berê jî ji aliyê Milîseyên "Firqit Elhemzat" ve, li Reşmeha 2020an Z hatibû revandin, li biryargeha wê -Avahiya Asayêşê ya berê li Hirşê Mehmûdiyê - li Bajarê Efrînê hatibû veşartin, û ew yek ji wê giropa jinên ku jê derketine bû -piştî desteserkirina Milîseyên "Artêşa Elîslam-Ceyş Elîslam" li ser biryargehê li 28.5.2020an Z - , û paşê jî li 23.12.2020an ji Hepsa "Maratê" hatibû berdan.

**= Girtinên bêsûcane:**

**-** Li 2.1.2022an Z, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" herdu hemwelatî "Hesen Ehmed Birîm/45/sal û Ehmed Reşîd Reşîd/50/sal" ji xelkê Gundê "Hecîka", bi behaneya hevkariya wan di parêzvaniya şevayî li dema R.X a berê de hatin girtin, û ta niha bêsûcane bendkirî ne.

**-** Li 5.1.2022an Z, Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê herdu hemwelatî "Ebid Elrehman Kulîlko/70/sal û Dawod Zênê/50/sal" ji xelkê Gundê "Me'imila" - N.Reco, bi behaneya hevkariya wan di parêzvaniya şevayî li dema R.X a berê de girtin, û li roja din -piştî ku li ser her yekî ji wan cezak diravî /1200/PT ferzkirin- ew berdan.

**= Qutkirina darên zeytûnê û daristanan:**

Li her demsaleke Zivistanê qutkirina dar û daristanan li Herêma Efrînê bi giştî li ser destên milîs û anîndeyan fere û zêde dibe, ta ku di karnava van çarsalên borî de gihîşte asta qirkirina jîngehê; Wek nimûne: Li 6.1.2022an Z /50/darên zeytûnê yên hemwelatî "Îdo Omer" li G."Kîmarê" - Şêrewa ji kokê ve hatin qutkirin, û qutkirina bêwijdan ji dora /300/dar re yên hemwelatî "Hesen Bekir Birîmko", dora /40/darî yên "Ebdo Xelîqe Elah" ji Gundê "Dargirê" - Navça Mabeta, û /90/dar ên "Ebdo Hesen", û /40/ dar ên malbata"Osman Ibrahîm Eşbûk" ji Gundê "Maratê" - B.Efrîn, ji aliyê çekdaran ve.

Û li Gundê "Kifêrê" - Efrîn -yê ku di bin desteseriya Milîseyên "Firqit Elhemzat" de- daristaneke ihracê -ye ku di destpêka heyştî de ji sedsala borî, li ser rûberiya /20/hiktar erd hatibû çandin - rastî şewtandin û qutkirineke fere hat, da ku were qirkirin; Û wêneyin bi sê dîrokên têvel ên "berî dagîrkirinê, Tîrmeh 2017 Z, Tebax 2018 Z, Rezber 2019 Z" hene, bi zelalî rewşa daristanê xuya dikin.

Û herweha jî li cîgeheke Rojhilatê Gundê "Çema" - N.Şera -ye ku di bin desteseriya Milîseyên "Melekşah" de- daristaneke sinoberan e çandiniyê -ye ku li heştiyî sedsala borî de li ser dora /120/hiktar erd hatibû çanidin- tûşî qutkirina berdewam û fere hat; Û wêneyine wê jî di sê dîrokên cihê de yên "Reşmeha 2018 Z, Rezbera 2019 Z -berî dagîrkirinê, Cotmeha 2020 Z" hene, bi zelalî qirkirina wê diyar dikin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li 3.1.2022an Z, termê kalemêrekî ji anînadeyên "Elşam" fetsandî, devgirtî û dest û ling girêdayî, di niştaciha wî ya di hundir mizgefta Gundê "Îska"- Şêrewa de hate dîtin, û hate xuyakirin ku telîfûna wî ya xilyewî û peremereyên di berîkê de jî hatine dizîn; Ew bi tena xwe rûniştî bû û ji xwe re sûtemenî difrot.

**-** Li Sibeha Sêşemê 4.1.2022an Z, pevçûnina di navbera giropeke çekdar ji çekdarên "Ehrar Elşam" de û rêbenda çekdar a heman milîseyan de, li ser riya giştî li Gundê "Tilsilorê" - N.Cindirêsê rûdan, û di encamê de, serkêşê "Lîwa'i Elmuhacirîn - Mehmûd Elbunyan" û kurê xwîşka wî yê vê re "Mis'eb Şihade Qasimo" ji giropê hatin kuştin, û hin din ji herdu aliyan birîndar ketin; Lê gundî tirsiyan û xwe sipartin malan.

**= binpêkirinin virdewêde:**

**-** Li 5.1.2022an Z, giropeke ji anîndeyan, bi navê komeleke fîxaniyê ketin mala hemwelatî "Kamîran Hesen Dolîko" ji xelkê Gundê "Me'imila" - N.Reco, li Taxa Eşrefiyê - B.Efrînê, da ku malê tevde û hertiştê destên wan bighîniyê bidizin; wan nebûna malbatê ji xwe re kirin fersend, û bi tenê diya "Kamîrên" a temenmezin û nesax li mal bû.

**-** Milîseyên "Firqit Elhemzat" ji xwe re(genim, ceh, colban, nîsk û hin tiştên din) di nav zeviyên zeytûna de yên xelkê Gundê "Şorbe" - N.Mabeta û hin din ên sînordar jê re yên xelkê Bajaroka "Meydankê" - N.Şera çandin, jê: /100/dar ên "Seydo Reşîd Seydo", /70/dar ên "Şêx Ebid Elrehman Ebid Elrehman", /120/dar ên "Farûq Xelîl", /275/dar ên "Mihemed Elî Elimî", /50/dar ên "Mihemed Elî Hişîno", û /20/dar jî yên "Hisên Şêx Osman kurê Mihemed".

Çawa herêmek wê aram be û ji vegera xelkê xwe yên penaberbûyî û koçberkirî re wê hazir be; Û ew di bin ewqas binpêkirin û tewanan de ye, û milîseyên ku nandozî û dizîn ji xwe re kirine kar, wê di nav xwe de parve dikin, û tê de gendeliyê pêk tîni?!

09.01.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

-------------------------

**Wêne:**

- Êrişkirina Gundê "Etmana" - N.Reco, ji aliyê Milîseyên "Firqit Elhemzat" ve.
- Roxandina avahiyekê li rex Dibistana "Etmana".

- Dizîna kelûpelên Dibistana "Etmana".
- şewatek li daristaneke çiyakî bi ser G."Etmana" ve.
- Pakrewan "Mihemed Se'îd Reşîd kurê Ebid Elmecîd".
- Jina girtî "Arîn Mihemed Dilî Hesen".
- Wêneyin bi dîrokin têvel ji daristaneke ihracê re, li G."Kifêrê" - Efrîn, Gogêl Êrs.
- Wêneyine bi dîrokine têvel ji daristaneke ihracê re, li Rojhilatê G."Çema" - N.Şera, Gogêl Êrs.